Schmidinger: Kurdistana Kurd behs dikin, di jiyana wan de pêk nayê

Viyena: Bi salan e ku Thomas Schmidinger xwe mijûlî Kurd û Kurdistanê dike. Lêkolînerê 37-salî li Enstîtûya Zanistên Siyasî ya Zanîngeha Viyenayê li paytexta Swîsreyê dixebite. Ji bilî xebata xwe ya zanistî Şmîdînger herweha damizrêner û endamê komîteya birêvebir a komeleya Leeza ye. Ev komeleya ku di sala 2004'ê de hatiye damezirandin, projeyên ji bo jinan li Bashûrê Kurdistanê û herweha projeyên ji bo penaberan li Ewrûpayê pêk tîne. Ji bilî van xebatan Leeza herweha agahiyên li ser Kurdên ji herçar perçeyên Kurdistanê dide hev û wan belav dike.

Ji ber ku Thomas Schmidinger li Viyenayê dijî û li vî bajarî hejmareke mezin ji Kurdan dijî, wî tim ev pirs ji xwe dikir: "Gelo Kurdistana ku Kurd tim behsa wê dikin, bi rastî di jiyana wan a rojane de peyda dibe?" Şmîdînger eşkere dike ku berî ku ew vê pirsê ji xwe bike, "ez ji ezmûna xwe ya bi salan ligel Kurdan giham baweriyekê ku Kurd hema bêje xwe mijûlî hevûdu nakin".

Ji bo ku ew bersiva vê pirsa xwe bike, Schmidinger lêkolîneke zanistî pêk anî. Ew demeke dirêj diçû çalakiyên Kurdên ji herçar perçeyên Kurdistanê û hevpeyvîn bi bêtir ji 140 welatiyên Kurd pêk anîn. Wî bi taybetî xwest bizanibe bê Kurdên nişteciyên Viyenayê kîjan alavên ragihandinê yên kurdî bi kar tînin.

Schmidinger dibêje ku encama lêkolîna wî ev bû, ku cudabûnên li welatên ku Kurdên Viyenayê jê hatine, bandorên cuda li ser wan pêk anîne. Lêkolînerê Swîsrewî ji bersivên Kurdan nas kir, ku Kurdên li Viyenayê ji sê beşan pêk tên: Kurdên soranîaxêv, Kurdên kurmancî-, zazakî- û tirkîaxêv ji Tirkiyê û Kurdên ji Rojavayê Kurdistanê, ku koma herî temenciwan e li Viyenayê.

Thomas Schmidinger diyar dike ku Kurdên ji Rojhilatê Kurdistanê û Îraqê bêtir nêzîkî hevûdu ne. Ew dibêje ku "wergereke yekser a bûyerên siyasî li Kurdistanê di komelgeha kurdî li Viyenayê de peyda dibe, bi taybetî di nav nifşê pêşî de ji Kurdên li Viyenayê". Wek mînak, perçebûnên partiyan ku li Kurdistanê pêk tên, dibin sedema perçebûnên li Viyenayê jî.

Şmîdînger du mînakan tîne zimên: "Piştî perçebûna di nav Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de, grûpa KDP-Îran li Viyenayê jî perçe bû. Herweha piştî ku Newşîrwan Mistefa dev ji Yekîtiya Nîştiman a Kurdistanê berda, li Viyenayê jî hevalên do bûn dijminên herî dijwar."

Thomas Schmidinger dibêje ku ji encamên lêkolîna wî gumanên wî rast derketin, ew jî ew e ku Kurd tim behsa Kurdistanê dikin, "lê ew di jiyana wan a rojane de pêk nayê; her aliyek tenê berê xwe dide herêma xwe".

www.rudaw.net: 11/2010